# SERKEFTIN

www.tevgerakomunist.com Hejmar: 02 Dîrok: Tîrmeh 2021 DENGÊ ŞOREŞ Û AZADIYÊ


# Biji Şoreş û Berxwedan

# عاشت الثورة والمقاومة



Dewleta Tirk a mêtînger bingehên xwe li ser xwîna gelan ava kir. Di avakirina dewletê de komkujiyên gelê Kurd, Ermen, Suryan, Aşur, Rûm û Elewî pêk anî û pergaleke dîktatorî ava kir. Hebûna xwe bi yek ziman, yek bawerî, yek al û yek netewîbûnê şekiland. Li hemberî vê zilm û zordariyê gelên bindest serî rakirin û dest bi têkoşînên azadiyê kirin. Îro Dewleta Tirk dixwaze ku têkoşînan bişkîne û vê pergala xwe ya dîktatorî li herêmê mîsoger bike. Bi vê armancê li Rojava û Başurê Kurdistanê êrîşên tunekirinê dimeşîne. Dewleta Tirk a mêtînger di salvegera komkujiya Ermeniyan de careke din dest bi êrîşa tunekirina têkoşîna azadiya gelê me yê Kurd kir. Ev êrîş bi berxwedaniyeke bêhempa hatin bersivandin û hîna jî ev berxwedan tê dayin.

Partiya Demokratîk a Kurdistanê (KDP) di van êrîşan de ji bo berjewendiyên xwe yên teng û kesayetî rê li ber mêtîngeran vekirin. Dewleta Tirk piştî ku dît nikare pêş ve bikeve KDP pêşmergeyên xwe kişand qada şer û li hemberî şervanên azadiya Kurdistanê ref girt. Kesayet û nûnerên ku li hemberî vê siyaseta hevkariya bi îxanetê re şermezar dikin hatin girtin. Siyaseta ku îro KDP'ê dimeşîne êdî sînorê hevkariyê derbas dike û vediguhere siyaseta dijminahiyê. KDP'ê pêwîst e demildest van gavên xwe yên dijminane bisekinîne. Ger ku Dewleta Tirk dikaribe herêmên azad dagir bike demildest wê destkeftiyên Kurdan ên li Başur û Rojavayê Kurdistanê têkevin bin gefên mezin. Dewleta Tirk bi van êrîşan dixwaze ku di heman demê de riya dagirkirina Rojava jî ji xwe re veke.

Gelê Kurd pêwîst e li her deverê rabin ser piyan û vê siyasete mehkum bikin. Roj raja li hemberî îxanetê parastina têkoşîna azadiyê ye. Îro hemû gelên azadîxwaz pêwîst e li gerîlayên azadiyê û Şoreşa Rojava xwedî derkevin.

أسست الدولة التركية الأستعمارية أولوياتها على دماء الشعب من أجل بناء الدولة أرتكبت مجازر بحق الكورد ,الأرمن ,السريان ,أشور, الروم والعلويين وأسست نظام دكتاتوري. شكلت وجودها باللغة واحدة ,ثقة واحدة. بالعلم الواحد ,وبطائفية واحدة .امام هذا الظلم والصعوبات رفعوا رأسهم وبدوأ في نضال الحرية.
اليوم الدولة التركية تريد كسر النضال وتضامن نظامها الدكتاتوري في المنطقة. وبهذا الهدف تسير بدمار الهجومات على روج افا وباشور كوردستان. بدأت الدولة التركية الأستعمارية مرة أخرى بدمار نضال حرية شعبنا الكوردي في ذكرة مجزرة أرمينيا. أختيارهم في هذا اليوم ليس تصادف. كانت أهداف الدولة التركية تسليم جميع أنجازات الشعب الكوردي في جبال باشور كوردستان.
ان الحزب الديمقراطي الكوردستاني ضمن هذه الهجومات ومن اجل مصالحه الضيقة والشخصيات يفتح الطريق امام الأسعماريين. ان الدولة التركية بعد ان رأت انها لا يمكنها التقدم قام الحزب الديمقراطي الكوردستاني بأرسال البيشمركة إلى ساحة القتال من اجل القتال امام مقاتلين حرية كوردستان. وتم القبض على الشخصيات والمندوبين الذين يسنكرون هذه السياسة المعاونة والخائنة.ان السياسة التي تمشيها الحزب الديمقراطي الكوردستاني انها تعدت مرحلة التعاون وتقلبها سياسة العداء.
ان الحزب الديمقراطي الكوردستاني يجب عليه وقف الخطوات العدائية الضعيفة.
ان الدولة التركية ان يمكنها احتلال المناطق المحررة فأنها ستضعف أنجازات الأكراد في جنوب وغربي كوردستان وستدخل في تهديدات كبيرة. بهذه الهجومات تريد الدولة التركية بنفس الوقت فتح طريق الأحتلال لها في روج افا. ويجب على الشعب الكوردي الخروج والوقوف وان تحكم هذه السياسة.كل يوم احمو نضال الحرية اما الخيانة. اليوم يجب على جميع الشعب الوطني ان يكونوا اصحاب كريلا الحرية وثورة روج افا.


2 ROJEV: Şoreşa Rojava Cihêtnameya Gelan e

7 JINA AZAD: Jin Bi Berxwedanê Şoreşê Dixemilînin

10 ÇIRÛSK: Pêşengtî Ciwan e

11 BÎRDOZÎ: Şoreş


## Pêşenga Komûnîst a Şoreşê Zîlan Destan Nemir e




Rêhevala me Zîlan Destan (Elende El Muhamed) di 13'ê Hezîranê de dema ku bi karen xwe yên şoreşgerî ve mijûl dibû şehîd ket û tevlî nava karvanê nemiran bû. Em wek Komûnîstên Şoreşger soz didin Rêhevala xwe Zîlan, wê tu hêz nikaribe têkoşîna me ya li hemberî mêtîngerî, dagirkerî û zilamperestiyê bisekinîne. Em ê ala ku te ji me re hiştiye li asîmanan bipêlpêlînin. Tu yê her dem di têkoşîna me de bijî û riya rizgariyê nîşanî me bidî.

# Şoreşa Rojava Cihêtnameya Gelan e



Sîstema kapîtalîzmê di serdema ku em tê de ne, di hemû cîhanê de gihîştiye sînorên xwe û di nav qeyraneke hebûn û tunebûnê de ye. Refbûna di navbera yên bindest û serdest de, di welat, herêm û hemû cîhanê de şerên polîtîk ên mezin derdixîne holê. Fikir û tiştên eydî sîstema kevin bi awayekî bi lêz hildiweşin û şert, têkîlî û hêzên nû derdikevin holê. Di destpêkê de li Rojhilata Navîn û erdnigariyên cîhanê yên cûda derfetên destkeftinên azadiya polîtîk ên gelên bindest mezin dibe. Di herêma me de pêvajoya şoreşên gelên Ereb destpê kir, jin, ciwan, ên bêkar, karker, kedkar hemû beşên çîna bindestan bi xwesteka wekhevî, azadî û edaletê rabûn ser piyan û di encama van serhildanan de beşek ji dikdatoriyên paşverû hilweşiyan. Serhildana ku li Rojhilata Navîn bi pêvajoya şoreşên gelên Ereb destpêkir li parçeyê Kurdistanê yê Rojava bi şoreşeke gelperêz û demokratîk tacîdar bû, ev jî bû mewziya herî pêşverû a vê pêvajoyê.

Dikdatoriya BAAS'î ya paşverû bi dest danîna ser hemû mafên netewî, demokratîk, çandî û aborî gelê Kurd bi siyaseta asîmîlasyonê vê rû bi rû hiştibû. Di encama vê siyaseta Dewleta Sûriyeyê de di nav gelê Ereb de şovenîzm wek bîrdariyeke serdest pêş ketibû. Li hember vê di netewa Kurd de li dijî gelê Ereb bêbaweriyeke netewî çêbibû.

Mêtîngeriya Sûriyê bi astengkirina hemwelatîbûna bi sed hezaran Kurdan, bi derxistina ji welatîbûnê dest danîbû ser milkê wan û mafê xwedîbûna milk, perwerde, tendurîstî, veguhastin, xebitîn û rêxistinbûnê asteng kiribû. Bi vê re ji bo xirabkirina yekîtiya erdnigarî, çandî, aborî, siyasî û şêwegirtina rihî projeya kemera Ereban xistibû dewrê.

Ji bo gelê Ereb jî pirsgirêka demokrasî, azadiya polîtîk her tim bibû pirsgirêka bingehîn. Rejîma BAAS a mêtînger li ser gelê Ereb jî siyaseteke zordest a dikdatoriyê meşandibû. Mafê azadî û xweîfadekirinê, mafê rêxistinbûnê hema hema hatibû tunekirin. Beşên ku wek partî xwe birêxistinkiribûn jî parçeyek ji rejîmê hatibûn kirin, siyaseta têkildarkirina bi istixbaratê ve hatibû meşandin û bi vî awayî jî giştî bi rejîmê ve hatibûn hevkarkirin. Nûsayriyên kêmhejmar ku desthiladariya dewletê dimeşandin jî li ser beşa pirjimarî ya sunî bi polîtîqayên cihêkarî serdestî avakiribûn.

Di dema mêtîngeriya BAAS de bi taybetî jin bi temamî hatibûn kolekirin. Ji ber perwerdeya Erebî zarokên Kurd ji mafê perwerdedîtina bi zimanê dayikê mehrûm mabûn. Dema pîşe bibe mijara gotinê ji ber ku Kurd ji qadên pisporî hatibûn dûrxistin û mafê wan ê perwerdê ji destê wan hatibû girtin di qada xebitînê de jî bi siyaseta cihêkariyê ve rû bi rû mabûn.

Di pêvajoya serhildanên gelên Ereb de agirê şoreşan di van şert û mercan de derbasî Sûriyeyê bû. Şoreşa Sûriyê hîn di destpêka xwe de ket bin bandora dewletên paşverû yên herêmê û hêzên emperyalîst. Gelê Kurd bi hêzên xweparastinê cih û warên xwe parast û şoreşeke demokratîk ragihand.Şoreşa Rojava, komên çeteyên îslamî û polîtîk ên wek DAÎŞ û El Nûsra ku parastina sîstema desthiladariya zilamperest dikirin têk bir. Li dijî van çeteyan bi navê hemû mirovahî û gelên bindest ên cîhanê serkeftineke mezin hat bi dest xistin. DAÎŞ'a ku li Iraq û Sûriyê tu hêzan nikarîbû li pêş wê bisekiniyana, li Kobanê rastî îradeya gelên Rojava, hêzên enternasyonal, şoreşger û komûnîstan hat û têk çû.

Şoreşa Rojava piştî serkeftina ku li Kobanê hat bidestxistin berê xwe da herêmên gelê me yê Ereb. Gelê Ereb êdî debar nedikirin ku di bin zilm û zordariya DAÎŞ'a hov de jiyan bikin û bang li hêzên şoreşger dikirin ku wan ji vê zilmê xelas bikin. Ji bo xelaskirina gelan şoreşa me êdî bere xwe da herêmên Sûriyê û ber bi Şoreşa Bakur û Rojhilatê Sûriyê ve çû. Gelên herêmê bi awayekî xurt tevlî nava refên şoreşger bûn û bi vî awayî şoreşa me ya ku bi daxwaza azadiya gelê Kurd dest pê kiribû veguherî şoreşa gelên herêmê. DAÎŞ'a hovane bi berxwedana gelên azadîxwaz ên herêmê ji Reqa heta Dêr-el Zorê li hemû axên Sûriyê hat tunekirin.

Şoreşa Rojava, derbeyeke mezin li pîlanên hêzên emperyalîst û dîkdatorên herêmê yên paşverû ku dixwastin cîhanê ji nû ve parve bikin xist û qadên tevgera wan sînordar kir. Têkoşîna gelên bindest a azadiyê ku ji serhildanên gelên Ereb dirêjî heta Şoreşa Rojava dibe bi şoreşa Rojava re mewziyeke mezin bi dest xist. Şoreşa Rojava li Sûriyeyê û Rojhilata Navîn hêza pêşeng û modêla yekîtiya azad a gelan afirand.

Şoreşa me, di gava xwe ya yekemîn de dawî li têkilîyên BAAS'î yên desthilatdariyê anî, saziyên devletê yên leşkerî û sîyasî tasviye kir, DAÎŞ têk bir, azadiya gelê Kurd a netewî bi dest xist. Şoreşeke azadîxwaz a zayendî û demokratîk ava kir. Bi vê şoreşê azadiyên polîtîk hatin bi dest xistin.

Şoreşa me di heman deme de dawî li têkilî û sazîbûnên zilamperst anî û li dewsa wan pergaleke azadîxwaziya zayendî ava kir. Dadgeh, zagon, artêş û sazîbûnên zilamperst hatin hilweşandin û sazî li gorî hişmendiya şoreşa jinê ji nû ve hatin sazkirin. Saziyên xweser ên jinan hatin avakirin û di riya van saziyan re di hindirê şoreşê de ji jêr heta jor ve jinan rêxistinbûnên xwe yên xweser ava kirin. Hêzên xweparasina jinê ji bo mîsogeriya destkeftiyên şoreşa jinê li hemberî dewlet û hişmendiyên paşverû şoreşa jinê parastin û hîn jî vê erke xwe bi cih tînin.

Bingeha Şoreşa me ya rêveberiya siyasî, girêdayî geşedanên siyasî û leşgerî şêweyên nû bi dest xist. Bingeha dînamîk a Rojava girêdayî pêdiviyên civakê yên ku li gorî şert û mercan diguhere her carê mecbûr ma ku xwe ji nû ve birêxistin bike. Ligel vê komîn û meclîsên ku mekanîzmayên gel ên biryargirtinê ne bi parastina nêrîna jiyana hevbeş, wekheviya navbera gel, ol, bawerî û zayendan hebûna xwe berdewam kir. Di rêveberiya siyasî ya şoreşa me de îradeya jinê, sîstema hevserokatî û temsîla hevbeş ji komînan heta meclîsan wek rêbazeke bingehîn tê berdewamkirin.

Bakur û Rojhilatê Sûriyê û Rojava ji ber sedemên derawa xwe ya stratejîk, xwedîbûna dewlemendiyên mezin ên xwezayî, pêşketina pêvajoya xwe ya dîrokî, rewşa xwe ya civakî û siyasî û hwd. mecbûre ku erkên parastin û avakirina şoreşê bi hev re bimeşîne. Di mercên ku êrîşên dagirker dewam dikin de şoreşa me hîna di bin gefên dewletên emperyalî û dewletên paşverû yên herêmê de ye. Êrîşên Dewleta Tirk a mêtînger ên li ser Efrîn, Serê Kaniyê û Girê Spî jî vê rastiyê kêlî bi kêlî teqeze dike. Gelên Rojava mecbûr in bi xwezayîkirina rastiya şer ve jiyana xwe berdewam bikin.

Pêşketina şoreşê girêdayî çareserkirina pirsgirêkên civakî û aborî yên gelên bindest e. Tevlîbûna gelên me ya erkên xweparastin û hevbeşkirina jiyana civakî şertê yekemîn ê pêşeroja şoreşê û bi pêş ve birina ber bi sosyalîzmê ve ye. Ger ku şoreş ji bo yên bindest bê kirin tiştekî ku nikaribin dest jê berdin, wê demê wê şoreş bê misogerkirin.

# ثورة روج افا هي التي تميز الشعوب

لقد وصل نظام الرأسمالية إلى حدوده في. جميع أنحاء العالم في العصر الذي نعيش فيه ، وهو في أزمة وجود وعدم وجود. الشقاق بين المظلوم والمسيطر ، مما أدى إلى حروب سياسية كبرى في البلاد والمنطقة والعالم أجمع. خواطر وأشياء النظام القديم يتفكك بسرعة وظروف وعلاقات وقوى جديدة آخذت الظهور. في البداية في الشرق الأوسط وأجزاء مختلفة من العالم زادت فرص الحصول على الحرية السياسية للشعوب المضطهدة. انطلقت مسيرة ثورات الشعوب العربية في منطقتنا نساء وشباب وعاطلين وعمال من جميع شرائح الطبقة.

انتفضا المظلوم برغبة في المساواة والحرية والعدالة ونتيجة لهذه الانتفاضات انهار جزء من الديكتاتوريات المتخلفة. تميزت الانتفاضة التي بدأت في الشرق الأوسط بسير ثورات الشعوب العربية بثورة شعبية وديمقراطية في الجزء من كردستان روج افا ، والتي كانت أيضًا المرحلة الأكثر تقدمًا في هذه العملية. واجهت الديكتاتورية المتخلفة ، مع استيلائها على جميع الحقوق الوطنية والديمقراطية والثقافية والاقتصادية للشعب الكردي ، سياسة الاستيعاب. نتيجة لسياسة الدولة السورية هذه تطورت شوفينية كذاكرة سائدة بين الشعوب العربية. من ناحية أخرى ، كان هناك انعدام ثقة قومي في الأمة الكردية تجاه الشعب العربي.

لقد حرم الاحتلال السوري مئات الآلاف من الأكراد من جنسيتهم ، وحرمهم من الممتلكات والتعليم والصحة والنقل والتوظيف والتنظيم. وبذلك تم وضع مشروع الحزام العربي لتقويض الوحدة الجغرافية .والثقافية والاقتصادية والسياسية والروحية للشعب بالنسبة للشعب العربي أيضًا، كانت قضية الديمقراطية والحرية السياسية دائمًا قضية أساسية. كما انتهج نظام البعث الديكتاتوري سياسة دكتاتورية ضد الشعب العربي. الحق في الحرية و التعبير عن الذات ، والحق في التنظيم شبه ملغي. الأحزاب التي نظمت نفسها كجزء من الحزب أصبحت أيضًا جزءًا من النظام، واتبعت سياسة استخباراتية ، وبالتالي تعاونت مع النظام بشكل عام. كما أن الأقليات القليلة التي مارست سلطة الدولة وضعت سياسات .مهيمنة على قطاع الأغلبية السنية بسياسات تمييزية تم تجنيد النساء على وجه الخصوص بالكامل خلال فترة احتلال البعث. حرم الأطفال الأكراد من الحق في التعليم بلغتهم الأم بسبب تعليمهم باللغة العربية. وعندما برزت المهنة بسبب استبعاد الأكراد من المجالات المهنية وحرمانهم من حقهم في التعليم ، واجهوا سياسة التمييز في مجال العمل.

خلال انتفاضات الشعوب العربية ، امتدت نيران الثورات إلى سوريا في ظل هذه الظروف. تأثرت الثورة السورية في البداية بالدول المنطقة المتخلفة والقوى الإمبريالية. دافع الشعب الكردي عن أرضه بقوات الدفاع عن النفس وأعلن ثورة ديمقراطية ، وهزمت ثورة روج افا العصابات الإسلامية والسياسية مثل داعش والنصرة التي دافعت عن النظام الذكوري. ضد هذه العصابات باسم البشرية جمعاء وحققت اسم البشرية جمعاء وشعوب العالم المظلومة نجاحا كبيرا. داعش ، التي لم تستطع أي قوة في العراق وسوريا أن تقف ضدها ، في كوباني هُزمتها إرادة روج افا والقوى الدولية والثوار والشيوعيين.

بعد الانتصار في كوباني ، استولت ثورة روج آفا على مناطق شعبنا العربي. لم يعد الشعب العربي قادرًا على العيش في ظل استبداد داعش وطالب القوى الثورية بإنقاذهم من هذا القمع. لإنقاذ الناس ، انتشرت ثورتنا الآن في مناطق سوريا والثورة في شمال وشرق سوريا. انخرط أبناء المنطقة بقوة في الصفوف الثورية ، وهكذا تحولت ثورتنا التي بدأت بالمطالبة بحرية الشعب الكردي إلى ثورة أبناء المنطقة. تم تدمير داعش بوحشية في جميع أنحاء سوريا ، من الرقة إلى دير الزور على يد مقاومة شعوب المنطقة المحبة للحرية.

لقد وجهت ثورة روج افا ضربة قاصمة لخطط القوى الإمبريالية والديكتاتوريين الإقليميين المتخلفين الذين أرادوا إعادة توزيع العالم وتحديد مجالات حركتهم.اكتسب نضال الشعوب المظلومة من أجل الحرية ، والذي استمر من انتفاضات الشعوب العربية إلى ثورة روج افا ، قدرا كبيرا من الأرض ثورة روج افا خلقت في سوريا والشرق .الأوسط قوة رائدة ونموذجا للوحدة الحرة للشعوب ثورتنا في مرحلتها الأولى أنهت علاقات بنك نظام البعث بالسلطة ، وفككت مؤسسات الدولة العسكرية والسياسية ، وهزمت داعش ، وحققت التحرر الوطني للشعب الكردي. أقامت الثورة تحرر ديمقراطية قائمة على النوع الاجتماعي. مع هذه الثورة تحققت الحريات السياسية.

كما أنهت ثورتنا العلاقات والمؤسسات التي يهيمن عليها الذكور واستبدلت بنظام الحرية الجنسية. المحاكم والقوانين والجيوش والمؤسسات التي يهيمن عليها الذكور.

أعيد تأسيسها حسب وعي الثورة النسائية. تم إنشاء المنظمات النسائية ذاتية الحكم ومن خلال هذه المؤسسات شكلت النساء منظماتهن ذاتية التنظيم من أسفل إلى أعلى خلال الثورة. دافعت قوى الدفاع عن النفس لنساء عن ثورة المرأة ضد الدولة والعقليات المتخلفة لضمان مكاسب ثورة المرأة ومازالت تقوم بهذا الواجب.

اتخذ أساس ثورتنا في الإدارة السياسية أشكالاً جديدة فيما يتعلق بالتطورات السياسية والعسكرية. يعتمد الأساس الديناميكي لروج افا على احتياجات المجتمع الذي يتغير وفقًا للظروف والظروف التي كان عليها دائمًا إعادة تنظيم نفسها. وعلى الرغم من ذلك ، استمرت المجتمعات والمجالس التي ليس لديها آليات شعبية لصنع القرار في الوجود مع حماية فكرة التعايش والمساواة بين الناس والدين والعقيدة والجنس. في الإدارة السياسية لثورتنا ، تستمر إرادة المرأة ونظام الرئاسة المشتركة والتمثيل المشترك من الكومينات إلى المجالس كأسلوب أساسي.

شمال وشرق سوريا وغربها بسبب أكاذيبهم الاستراتيجية ، وامتلاكهم لثروات طبيعية كبيرة ، وتطور مسارها التاريخي ، ومكانتها الاجتماعية والسياسية ، وما إلى ذلك. يجب أن يقوموا بمهام الدفاع عن الثورة وبناءها معًا. لا تزال ثورتنا تحت تهديد الدول الإمبريالية والدول المتخلفة في المنطقة في الظروف التي تستمر فيها هجمات المحتل. كما تؤكد الهجمات الإرهابية التي شنتها الدولة التركية على عفرين وسري كانيه وكري سبي هذه الحقيقة من حين لآخر. إن شعوب روج افا ملزمة بمواصلة حياتها بتطبيع واقع الحرب.

يعتمد تقدم الثورة على حل المشاكل الاجتماعية والاقتصادية للشعوب المضطهدة. إن مشاركة شعوبنا في واجبات الحفاظ على الذات والمشاركة في الحياة الاجتماعية هي الشرط الأول لمستقبل الثورة ولتقدم الاشتراكية. إذا كان للثورة أن تفعل شيئًا للمضطهدين لا يمكنهم تحمله ، فإن الثورة ستكون مضمونة.



### TKŞ'ê li ser provakasyona KDP'ê daxuyanî da

# Li hemberî mêtînger û hevkarên wan em ê biserkevin

Dewleta Tirk a mêtînger ji 20'ê Tirmeha 2015'an ve Konsepta Tunekirina Temamî li ser gelê Kurd û şoreşgeran dimeşîne. Dewleta Tirk rûxmî ku ew qas êrîş bir ser şoreşgeran nikare têkoşînê bişkîne. Ji ber vê yeke siyaseta şer bi dijwarî kûrtir dike. Herî dawî ji 23'ê Nîsanê de êrîşî Zap, Metîna û Avaşîn dike. Lê her çiqasî bi hemû teknîka NATO diçe û hemû hêzên emperyalî û paşverû piştgiriya wê dikin jî nikare berxwedanê bişkîne. Ji ber vê anha jî KDP'ê dişine ser hêzên Têkoşîna Azadiya Kurdistanê û dixwaze di nav Kurdan de şer derxîne.

KDP'ê ji dêvla ku piştgiriyê bide têkoşîna azadiyê, hemû derfetên xwe ji bo azadiya Kurdistanê bixebitîne,ji bo ku têkoşînê bifetisîne pêşmergeyên xwe dişine şerê gerîlayan. Siyasetmedar û çalakvanên Kurdan digire bin çavan, şoreşger û demokratên Kurd û dostên wan digire û dixwaze wan suçdar bike. Hemû kesên ku ji bo azadiyê tevdigerin û naxwazin di nava Kurdan de şer derkeve li dijî xwe gef dibine. KDP'ê bi van pratîkên xwe nişan dide ku di navbera siyaseta wê û siyaseta Dewleta Tirk de cudahî nemaye.

KDP'ê angaşt dike ku hebûna gerîlayên Azadiya Kurdistanê dibe sedema êrîşên Dewleta Tirk û encax bi derxistina gerîlayên PKK'ê wê êrîşên Dewleta Tirk bisekinin. Dîsa dibêje ku PKK'ê hurmet nîşanî statûya Başur nade û statûya wê dixe xeteriyê. Ji aliyekî êrîşan dibe ser eniyên gerîla û ji aliyekî jî dixwaze rastiyan berevajî bike sucên xwe biavêje ser PKK'ê. Bi van angaştan dixwaze ku êrîşên xwe yên li ser PKK'ê mafdar bike. Xuyaye ku ev ne tenê pîlanên KDP'ê ne. KDP'ê tena serê xwe nikare van gavên wiha berfireh û xeter bavêje. KDP'ê bi piştgiriya Emerîkaya emperyalî û Dewleta Tirk a mêtînger van êrîşan pêk tîne.

Dewleta Tirk a mêtînger armanca xwe venaşêre. Dixwaze ku Şoreşa Rojava hilweşîne, ji Efrînê heta Xakurkê di kûrahiya 40 km de hemû xaka Kurdistanê dagir bike, Tevgera Azadiya Kurdistanê ji holê rake. KDP'ê îro piştgiriya van daxwazan dike, ji bo ev pêk bên pêşiya Tirkan vedike. Rêveberên KDP'ê êdî doza netewî berdane û tenê ji bo berjewendiyên xwe tevdigerin. Lê berxwedana ku tê dayin wê hemû mêtîngeran û hevkarên wan bin bixe. Di serî de em bang li gelê me yê welatparêz ên Başurê Kurdistanê dikin ku li hemberî vê siyaseta ku hevkariyê bi mêtîngeran re dike rabin ser piyan û ji bo yekîtî û azadiya çar perçeyên Kurdistanê piştgiriya berxwedana azadiyê bikin. Hemû Kurd û gelên Rojhilata Navîn, kesên şoreşger, komûnîst, demokrat û aştîxwaz pêwîst e li hemberî rêveberên KDP'ê û Dewleta Tirk bisekinin û berxwedanê mezin bikin.

# Pêşenga Komûnîst a Şoreşê Zîlan Destan Nemir e



Rêhevala me Zîlan Destan (Elende El Muhamed) di 13’ê Hezîranê de dema ku bi karen xwe yên şoreşgerî ve mijûl dibû şehîd ket û tevlî nava karvanê nemiran bû. Rêheval Zîlan weke jineke Kurd a ciwan êşa bindestiya welatê xwe di her kêliyê de, di her lêketina dile xwe de ji kûr ve dihisiya. Dema çeteyên hov ên dijminê mirovahiyê êrîşî Kobanê kirin, neçar ma ku bi malbata xwe re derbasî Bakurê Kurdistanê bibe. Derbaskirina wê ya xetên mêtînger ne tenê şiklî bû. Rêheval Zîlan dema ku ew sînorên li ser welatê xwe hatine dayin derbas kir astengiyên ku mêtîngeran di aqilê wê de çandibûn jî derbas kir û eşqa welatekî azad di dile wê de hîn bêhtir kokên xwe girtin.

Xwesteka wê ya azadkirina welatê xwe roj bi roj ew ber bi lêgerînekê ve dikişand. Rêheval Zîlan dema şehîdketina jina komûnîst Destan Temûz bihîst, êdî biryar dabû bê jiyaneke çawa dixwaze. Bi wêrekiyeke xurt û vîneke ji polad mîna Çûka Sîmurg ji bo azadiya welatê xwe bîrdozî û ramanên Komûnîst pejirand û li ku derê pêdiviya gelê wê pê hebe li wir bi cih bû. Rêheval Zîlan dizanîbû ku azadiya bindestan bi pergaleke resmalî ne pêkan e û ji bo vê pêwîst e ramanên Komûnîst li her deverê bên belavkirin û danasîn. Ji bo erka xwe ya dîrokî bi cih bîne li hemû Herêma Cizîrê gav bi gav geriya. Derî bi derî, mal bi mal, gund bi gund ramanên Komûnîst şîrove kir û bû yek ji damezrênerê pêşeng ê tevgera me.

Rêheval Zîlan weke jineke ciwan bindestiya zayendî bi awayê herî giran jiyan kiribû. Berî Şoreşa Rojava ya Jinê pêk were serdestiya zilamperest nehiştibû ku bêhneke rehet karibe bistîne. Hişmendiya ku zilam pîroz dikir û her tişt milkê wan didît di jiyana Rêheval Zîlan de nakokiyeke pir kûr ava kiribû. Bi Şoreşa Rojava ya Jinê re êdî Rêheval Zîlan biryar dabû ku dest bi meşa xwebûnê bike û Elende hilweşîne û li dewsa wê Zîlana azad ava bike. Rêheval Zîlan zanîbû ku azadiya civakî ger ku azadiya jinê neyê mîsogerkirin ne pêkan e. Ji ber vê yekê di nav refên Jinên Komûnîst ên Şoreşger (JKŞ) de bi hemû hêz û qabiliyeta xwe, bi şev û roj xebat meşand û bû yek ji damezrênerê wê. Astengiyên ku derketin pêşiya xwe kir sedema hilweşandina kevneşopiyan û gav bi gav mînaka jina azad ava kir. Ji bo azadkirina hemû jinan, avakirina çivakeke bêçîn, bêzayend û bêdesthilatdarî bi armanca avakirina civakeke sosyalist heta cihê ku bêhna wê têrê kir meşiya. Bi vê meşê ji hemû jinan û jinên ciwan re riya tekane ya rizgariyê nîşan da.

Rêheval Zîlan weke ciwan bi hêz, ked û bextiyariya xwe di nav ciwanan de bû stêrkeke ku di şeva tarî de rê nîşan dide. Li hemberî tarîtî û hovitiya pergala resmalî, li hemberî rêbazên şerê taybet di nav ciwanan de xebata ronîkirinê meşand û dixwest ku hemû ciwanan li dora ramanên Komûnîst kom bike. Bi taybet jî êşa jinên ciwan agir bi dile wê dixist û dikir ku bênavber di nav ciwanan de têkoşînê bimeşîne. Roj hat rext û çekê xwe hilda û li hemberî êrîşên dagirkeran di eniyên herî pêş de cih girt. Roj jî hatin rahişt pênûs û pirtûka xwe di akademiyan de, di malan de, di kargehan de bû mamosteya ciwanan. Rêheval Zîlan hêza ciwanan baş dizanîbû û ji ber vê tu carî nediwestiya. Carinan bi piyan carinan jî bi duçarxeya ku ji hevalên xwe emanet girtibû kolan bi kolan li bajarê ku lê dixebite digeriya û erken xwe bi cih dianî. Li cihên ku xebat dimeşand êdî navê Ciwanên Komûnîst ên Şoreşger (CKŞ) û navê Rêheval Zîlan bibû yek. Rêheval Zîlan di avakirina ciwanên komûnîst de bû pêşengek û her dem wê riya ciwanan ronî bike.

Rêheval Zîlan ji bo xelasiya karker, jin û ciwanan bi hemû keda xwe heta kêliya dawî xebat meşand, ked da. Rêheval Zîlan ji banga şehîdan re bi jiyana xwe bersiveke pir girîng da. Nîşaneya mirova azad ava kir û hemû sînorên mêtîngeran perçe kir. Li enternasyonalîzma karkeran heta dawîyê xwedî derket û ji banga Şehîdên Pirsusê re bersiva herî delal da. Ji bo avakirina TKŞ, JKŞ û CKŞ’ê her kêliya jiyana xwe bi xebat û têkoşînê birêxistin kir. Tu carî nehişt ku hêviya xwe bişke. Baş dizanîbû ku pêşeroja şoreşa Rojava bi bîrdariyeke komûnîst wê bigihêje serkeftinê.

Em wek Komûnîstên Şoreşger soz didin Rêhevala xwe Zîlan, wê tu hêz nikaribe têkoşîna me ya li hemberî mêtîngerî, dagirkerî û zilamperestiyê bisekinîne. Em ê ala ku te ji me re hiştiye li asîmanan bipêlpêlînin. Tu yê her dem di têkoşîna me de bijî û riya rizgariyê nîşanî me bidî.

Pêşenga Ciwan a Komûnîst Zîlan Destan Nemir e

Pêşenga Komûnîst a Şoreşê Zîlan Destan Nemir e

Rêheval Zîlan Riya Me Ronî Dike

# القائدة الشيوعية للثورة زيلان دستان لاتموت

استشهدت رفيقتنا زيلان دستان (إلندا المحمد) في ١٣ يونيو أثناء مشاركته في أنشطته الثورية والانضمام إلى قافلة الخالدين. شعرت الرفيقة زيلان ، كشابة كردية شابة ، بألم قهر بلدها في كل لحظة ، في كل نبضة في قلبها. عندما هاجمت عصابات العدو المتوحشة على الانسانية في كوباني ، اضطرت العبور إلى باكور كردستان . لم يكن عبورها لخطوط القياس رسميًا فقط. كما تغلبت الرفيقة زيلان على العقبات التي زرعها المتشددون في ذهنها عندما عبرت الحدود المفروضة على بلدها ، وتجذّر حب الوطن الحر أكثر في قلبها.

دفعتها رغبتها في تحرير بلدها إلى البحث يومًا بعد يوم. الرفيقة زيلان ، عندما سمعت باستشهاد المرأة الشيوعية دستان تموز ، كانت قد قررت نوع الحياة التي تريدها. بشجاعة قوية وروح فولاذية مثل طائر سيمورج من أجل حرية بلادها . اعتنقت الأيديولوجيات والأفكار الشيوعية واستقرت. حيث يحتاجها الناس. عرفت الرفيقة زيلان أن حرية المضطهدين غير ممكنة من خلال نظام الراسمالي وأن الأفكار الشيوعية بحاجة إلى نشرها والترويج لها في كل مكان. خطوة بخطوة في جميع أنحاء منطقة الجزيرة لإنجاز مهمتها التاريخية. من باب إلى باب ومن منزل إلى منزل ومن قرية إلى قرية فسرت الأفكار الشيوعية وأصبحت أحد المؤسسين الرائدين لحركتنا.

كانت الرفيقة زيلان قد عانت من التحرش الجنسي عندما كانت شابة. قبل ثورة المرأة في روج افا ، لم تسمح الهيمنة الأبوية لها بالتنفس الصعداء. إن الوعي الذي يحتفل به الرجال ويرون كل شيء على أنه ممتلكاتهم قد خلق صراعًا عميقًا جدًا في حياة الرفيقة زيلان. مع ثورة المرأة في روج افا ، قررت الرفيقة زيلان بدء مسيرة نصّبت نفسها باطاحة الندا وبناء زيلان حرة مكانها. عرفت الرفيقة زيلان أن الحرية الاجتماعية لن تكون ممكنة إذا لم يتم التمسك بحرية المرأة. لذا في صفوف النساء الشيوعيات الثوريات (JKŞ) عملت ليل نهار بكل قوتها وقدرتها وأصبحت واحدة من مؤسسيها. أدت العقبات التي ظهرت إلى انهيار التقاليد ورسخت تدريجياً نموذج المرأة الجديدة.

من أجل تحرير جميع النساء ، سارت بناء مجتمع فقير وضعيف بهدف بناء مجتمع اشتراكي إلى النقطة التي كانت فيها أنفاسه كافية. أظهرت هذه المسيرة الطريق الوحيد للخلاص لجميع النساء والشابات.

الرفيقة زيلان عندما كانت شابا بقوته وعمله الجاد وسعادته بين الشباب أصبحت نجمة تنير الطريق في الليل المظلم. ضد ظلام ووحشية النظام الراسمالي ، ضد أساليب الحرب الخاصة ، قامت بعمل التنوير بين الشباب وأرادة أن تجمع كل الشباب حول الأفكار الشيوعية. كان ألم الشابات على وجه الخصوص تحترق في قلبها ويجعلها تكافح بلا انقطاع بين الشباب. أشرقت الشمس وحملت السلاح واتخذت مواقع على الخطوط الأمامية ضد العدو. كما جاء اليوم الذي حملت فيها قلمها وكتابها وأصبحت مدرسًا للشباب في الأكاديميات والمنازل والمصانع. كانت الرفيقة زيلان تعرف قوة الشباب جيداً ولذلك كانت ترغب أحيانًا سيرًا على الأقدام ، وأحيانًا على دراجة كانت قد عهدت بها إلى أصدقائه ، كانت تتجول في شوارع المدينة حيث كانت تعمل وتؤدي واجباتها. أصبحت اسم الشبيبة اسم الرفيقة زيلان في الأماكن التي تم فيها العمل. كانت الرفيقة (CKŞ) الشيوعية الثورية زيلان رائدا في تكوين الشباب الشيوعيين وستقوم دائما بإلقاء الضوء على طريق الشباب.

لقد عملت الرفيقة زيلان بجد من أجل خلاص العمال والنساء والشباب حتى اللحظة الأخيرة. قدمت الرفيقة زيلان استجابة مهمة للغاية لنداء الشهداء بحياتها. وكُسرت كل حدود العادات. أخذت TKŞ، الأممية العمالية زمام الأمور حتى النهاية واستجابت بلطف أكثر لنداء شهداء برسوس. لبناء JKŞ و CKŞ . نظمت كل لحظة من حياتهم من خلال العمل والنضال. بأن لا تدع آمالك تتحطم أبدا.

نحن ، كشيوعيين ثوريين ، نعد رفيقنا زيلان بأنه لن تكون هناك قوة قادرة على وقف نضالنا ضد الاستبداد والاحتلال والسلطة الذكورية. سنرفع العلم الذي تركته لنا في السماء. سنعيش دائمًا في جهادنا وتبين لنا طريق الخلاص.

القائدة الشابة للشيوعية زيلان دستان لاتموت
القائدة الشيوعية للثورة زيلان دستان خالدة
الرفيقة زيلان تنير طريقنا

Rastiye Jiyanê, Ji Penûsa Jinê

RAPERIN

Dîrok: Tîrmeh Hejmar: 02 / Weşana taybet ji bo salvegera şoreşa jinê

# Di salvegera 9'emin de rastiya Şoreşa Jinê

Dema Rojava tê gotin berxwedan, şoreş, azadî û jin, ciwan û dayikên me yên ku silah di dest de parastina axa xwe dikin tên. Şoreş neh salên xwe derbas dike û bêguman gotina me ya "Rojava şoreşa jinê ye" ji teoriye derket û di parastin û avakirina şoreşê de, bi kurtasî di hemû qadên jiyanê de xwe îspat kir. Şoreşa Rojava ya jinê di neh salan de di rêya azadbûna jinê de ji hemû cîhanê re deriyek vekir. Li Rojava gotina tu cih û qadên ku ked û destê jinê lêneketiye tune ye wê ne şaş be. Di avakirina pergala xweser ya demokratik de rêxistinkirina saziya hevserokatiyê û misogerkirina asta temsîliyeta wekhev deskeftiyên girînk ên ku hatine bi dest xistine. Şoreşa jinê elbet parastina hebûna xwe bê artêşa jinê nikare pêk bînê û ger artêşa jinê tune be ya nikarîbû biparêze. Ji bo parastina azadî û destkeftinên şoreşê jinan di her mewziyekî axên Rojava de cihê xwe girt. YPJ'ya hêza xweparastina bi hezaran jinan e nîşanî hemû jinên herêm û cîhanê kir ku tiştekî ku jinên di dest de sîlah neke tune ye. Di qada siyasî de pêşbîniyên zilamperest hat hilweşandin û pêşiya herî zede cih girtina jinan di siyasetê de bi şoreşê vebû. Ji asayîşê heta dadê hemû pergal li gorî vê hat rêxistinkirin.

Jinên Komûnîst ên Şoreşger (JKŞ) di nav vê şoreşê de wek dîrokî ji destpêka şoreşê heta niha di nav şoreşê hem di qada leşgerî de hem jî di qada civakî û avakirina şoreşê de erkên girînk girtin ser milê xwe, rola xwe lîstin, îro jî bi perspektîfa sosyalîzm û komûnîzmê cihê xwe digirin. Sembola jinên komûnîst li Rojava û Bakurê Sûrî di milê leşgerî de yek ji sembola berxwedan Kobanê Şehîd Sarya, sembola enternasyonalîst ya şerê Til Temir şehîd Îvana Hoffmann (Avaşîn Têkoşîn) li Minbiç şehîd Raperîn Dîcle, li Reqa şehîd Destan Temmûz û di qada avakirina şoreşê de pêşenga komûnîst a ciwan Zîlan Destan mînakên vê mijarê ne. Dîsa 8 hevalên me yên jin ku di komkujiya Pirsûsê ya sala 2015'an de di nav 33'ê şehîdan de cihê xwe girtin ji bo xewn û xeyalên xwe yên mezinkirina şoreşa jinê dixwastin derbasî Kobanê bibin. Îro di 9'emîn salvegera şoreşê de jinên komûnîst rûmeta bi maf a şirîk û pêşengbûna vê şoreşê jiyan dikin. Şoreşa jinê ya ku ev neh salan e bi destkeftinên mezin gihaştiyê vê rojê di her alî de di bin êrîş û dorpêçeke mezin de ye. Hemû êrîşên dijmin ên hundir û der ve destpêkê de vîna jinê hedef digire. Bêguman parastina tevahî destkeftinên jinê destpêkê de bi parastina ax, dîrok û çandê misoger dibe. Ji ver vê yekê pêwîst e destpêkê de jin li hember dagirkerî û mêtîngêriyê bisekine û xwedî li pêşeroja xwe der bikeve. Çiqasî ku êrîşeke mezin ên dewletên resmaliyetê li ser tê ferzkirin, ji bo şoreşa jinê neguhertina feraseta kevnare a zilamperst û pergala baviksalarî ew qes xetereyeke mezin e. Ji ber ku di her qada jiyanê de pergala resmaliyetê hebûna xwe li ser tunekirina nasnameya jinê ava dike. Îro di ev pêvajoya ku em tê de derbas dibin ji bo xurtkirina bingeha şoreşê û ji bo misogerkirina şoreş û destkeftinên jinê pêwîst e di her alî de tedbîrên sosyalist bên zêdekirin û ber bi merhaleyeke nû ve bê çûyîn.

Jinên Komûnîst di asta yekemîn de van tedbîran wiha digire dest:

** Hemû sazî wê li gorî rêgeza wekheviya zayenda civakî û temsîliyeta hevbeş kar û xebatên xwe bidomînin, têkîlî û nêzikatiyên ku vê astê paş ve bikişîne wê neyên qebûlkirin. Tedbîrên îdarî û zagonî ku wekheviya zayenda civakî xurt bikin wê di asta makeqanûnî de bên misogerkirin. Di qadên ku şoreş nû gihaştiyê ye jî wê bi vê nêrînê bê tevgerîn.

** Ji bo misogeriya di xeta azadiya jinê de avakirina civaka nû, jin kar û xebatên xwe yên rêxistinkirina sazîbûnên civakî wê bi awayekî serbixwe jî bidomînin. Di hemû saziyan de ligel temsîliyeta hevbeş artêşa jinê û yekîneyên parastina cewherî yên jinê wê bên xurtkirin. Di hemû xebatên ku di qada azadiya jinê de ne selahiyeta qanûndanînê û hemû erk wê di destê saziyên jinan de bin. Ji bo têkoşîna azadiya jinê û destkeftinên wê di hemû jiyana civakî de şênber bibin wê tedbîrên pêwîst bên girtin. Zexta ku têkîliyên malbatî û eşîrtî rê li ber vekirine jî di nav de, li dijî serdestiya zilamperest têkoşîna îdeolojîk û siyasî wê di her qadê de bi biryardarî bên meşandin.

** Şoreşa me wek ku şoreşa gel a demokratîk û şoreşa jinê derbasî nav hev bûye, wek desthiladariya gel û rêveberiya jinê ev wesfa desthiladariya dumend wê bê kûrkirin. Avakirina sîstema jinê wê bê hedefgirtin.

** Sazîkirinên zagonî yên ji bo cezakirina sucên li dijî jinê yên wek tundî, qetlîamên jinê, sucên zayendî bên zêdekirin wê bi biryardarî bên tetbîqkirin. Dadgehên ku tê de sucên li dijî jinê tên dadgehkirin wê bên damezrandin.

** Ji bo rakirina koletiya jinê ya hundirê malê ji holê bê rakirin û bi armanca civakîkirina karên malê sazîkirinên pêwîst wê bên avakirin. Wê li erk dîtina xwedîkirina astengdar, nexweş, kal û pîran karê jinê dibîne dawî bê anîn. Jinên kedkar ên malê wê bên xistin berfirehiya heqê bingehîn û sîgortaya civakî. Ji bo jinên kedkar ên malê ber bi qadên xebatên civakî ve bên teşwîqkîrîn sazîkirinên pêwîst wê bên avakirin.

** Şertên jiyan û xebatên jinên proleter û nîv proleter ku di xademiya malan de û li malan bi berdêl kar dikin wê bên sererastkirin û wê bê kirin ku rêxistinên xwe yên kar ava bikin.

** Kûrtaj wê ji bo hemû jinan wek mafeke zagonî û belaş be. Kontrola zarokanînê berpirsiyariya jin û mêr a hevbeş e. Mijarên ku jin karibe li ser bedena xwe biryar bide wek rêbazên zarokanînê û hwd. Wê di bin misogeriya zagonî de be.

** Tu kes ji ber nasnameya xwe ya zayendî nikare bê biçûkxistin û bi cudahîbûnê re rû bi rû bê hiştin. Li dijî nêzikatî û gotinên rikê yên li dijî nasnameyên zayendî têkoşîna îdeolojîk tê meşandin û mueyîdeya cezayî tê xistin meriyetê.

** Bazirganiya cinsîtî û koletiya cinsîtî qadexe ye. Mafê jiyana jin, zarok û LGBTÎ+ ên koleyên cinsîtî tê misogerkirin. Ji bo dabînkirina mercên jiyana hilberîner a civakî piştgirî tê dayin.

** Dawî li pratîkên wek qelen, berdêl, zewicandina ji bo berdêla xwînê ku li dijî şoreşa jinê tên berdewamkirin tê anîn. Zewaca zêde û zewicandina di temenê biçûk de qedexe ye. Bendên hevpeymana civakî û zagonên jinê bi biryardarî tên tetbîqkirin.

** Têkîliyên cinsî yên di hundirê malbatê de (ensest) qedexe ye. Li dijî vê têkoşîn tê meşandin, di rewşên ku tê jiyankirin de jî, di berfirehiya zagona sûcên zayendî de tê cezakirin.

** Xwedîkirina zarokan wê wek karekî civakî bê hesibandin û zarok wê wek nirxeke hevbeş a civakî bên pejirandin. Berî û piştî zarok anînê ji bo jinan 6 meh, ji bo mêr an jî wê sê meh îzîn bê dayîn. Şîr û hifadên zarokan wê bêpere bibe, di hemû saziyên ku di mezintiyeke diyar de ne, odeyên şîrdayinê, zarokistan û bexçeyên zarokan wê bên mecbûr kirin.

** Mafên zarokan wê bên misogerkirin, sûcên li dijî zarokan ên zayendî, tundiya fizîkî, aborî, psîkolojîk (nefsî) û istîsmar di berfirehiya sûcên giran de wê bê sêwirandin. Ji bo van sûcan dadgehên mafên zarokan wê bên damezrandin.

# Jin û Şerê Taybet



Li Bakur û Rojhilatê Sûrî û bi taybetî li Rojava dijmin ji bo şkenandina vîna şoreşê rê û rêbazên piralî bikar tîne. Yekem bi dorpêçkirina şoreşê û şerê leşkeri tê xwestin ku vê şoreşê ji kok de bi bin bixin. Ev neh salên şoreşê ye ku rojek bê şer derbas nebûye. Lê di 9'emîn salvegera şoreşê de gelên herêmê bi xwedîderketina ax û vîna xwe armanca dijmin vala derxistin.

Şoreşa me ya ku li ser vîna gelên Kurd, Ereb, Suryan, Ermen û ciwan, karker, kedkar û hwd. hatiye parastin û mezinkirin di aliyekî de bi hebûn û pêşketina jinê rastî û bingeha şoreşa jinê ye. Ji ber vê dijmin êrîş û kirinên xwe yên qirêj herî zede li ser jin û ciwanan ferz dike. Ligel şerê leşgerî bi riya şerê taybet dixwazin hundirê şoreşê vala bikin. Jin esasa civakê û esasa hilweşandina feraseta baviksalarî ye. Ciwan bingeh û pêşeroja şoreşê ne.

Em dikarin li ser çend xalên rê û rêbazên meşandina şerê taybet bisekinin. A yekemîn li muqabilî pere û hwd. rêxistinkirina sîxurtiyê ye. Bi vê riyê mirov ji rastî û rûmeta xwe tên dûrxistin û li dijî gelê xwe tên dijminkirin. A duyemîn belavkirin û teşfîqkirina bikaranîna hişbir, meşrûp, heb û herwekîdin e. Bi vê riyê ji ciwan û zarokên şoreşê nifşeke ku ji mejiyê wê hatiye tewizandin û ji dîrok û manewiyata xwe dûr ketiye tê avakirin. Riya sêyemîn û ew qas girîng jî meşandina şerê taybet li ser bedena jinê ye. Ji bo vê jî weke ji bo belavkirina hişbir û heban, bi taybetî şebeke û şane tên birêxistinkirin. Jinên ciwan tên xistin vê riyê û ji Rojava heta bajarên Bakurê Sûrî bi destê van şebeke û şaneyan ev kar tê meşandin. Dîsa zêdebûna kuştuna jinê bi sedemên gelekî cuda, zêdebûna xwekuştinên jinê yên biguman parçeyek ji şerê taybet e. Armanca vê rastiyê ew e ku îro ev şoreşa ku wek şoreşa jinê mohra xwe li dîrokê xistiye ji bingehê de bê hilweşandin.

Em dikarin bêjin ku di dîrokê de gelek şoreş ji aliyê kapîtalîzm û emperyalîzmê ve bi riya şerê taybet û beşek ji vê di aliyê exlaqî de hatine hilweşandin. Ji ber ku li gorî fikra kapîtalîzmê exlaq li ser beden û cinsitiya jinê di nav civakê de tê çandin. Li gorî vê bedena jinê wek exlaqa jinê tê ferkirin. Dema beden û exlaqa jinê bê xirabkirin wê demê ew civak bi hêsanî tê xirabkirin û hilweşandin. Ji ber vê yekê dijmin bi mejiyê xwe yê zilamperest dema ji bo şer biçe ku derê bila biçe di destpêkê de êrîşî jin û bedena wê dike. Şengal, Erfrîn, Serê Kaniyê mînakê vê ne. Îro di nav civaka me de zêdekirina firotina bedena jinê ne tiştekî ji rêzê ye. Mînak şoreşa sovyetan bi şerê leşkerî xirap nebû. Dewleta Emerîka ji destpêkê heta dawî di her alî de şerê taybet meşand. Yek ji van riyan dîsa talankirina bedena jinê bû. Yek ji taybetmendiya şerê taybet ew e ku ne şerekî ber bi çav e. Di her alî de hêdî hêdî û veşartî tê meşandin. Gelek caran mirov pê nahese, piştî demekê tu dinêrî ku her tişt, dîrok, ziman, çand, manewiyat hêdî hêdî tune bûye.

Îro di nehemîn salvegera şoreşê de ji bo hilweşandina şoreşê di her alî de êrîş tên anîn ser şoreşê. Ya yekemîn şerê leşgerî, duyem şerê aborî, sêyem jî şerê taybet bi hev re tên meşandin. Di van sê xalan de jî hedefa yekemîn jin e. Ji ber vê yekê pêwîst e em di her alî de xwedî li vîn û pêşeroja xwe derbikevin. Ger em wek jin xwedî li destkeftinên xwe ên ku me bi bedêla xwîna hezaran şehîdan bi dest xistiye dernekevin wê di her alî de hebûna me bê şkenandin. Rastiya ku şoreşa Rojava di cîhanê de wek şoreşa jinê daye naskirin rastiya fikir û felsefeya me ye.

Li dijî her cure şer xwedî li îradeya jinê derkeve...

# المرأة والحرب الخاصة

أسست الدولة التركية الأستعمارية أولوياتها على دماء الشعب من أجل بناء الدولة أرتكبت مجازر بحق الكورد.الأرمن.السريان.أشور .الروم والعلويين وأسست نظام دكتاتوري .شكلت وجودها باللغة واحدة.ثقة واحدة.بالعلم الواحد .وبطائفية واحدة .امام هذا الظلم والصعوبات رفعوا رأسهم وبدوأ في نضال الحرية. اليوم الدولة التركية تريد كسر النضال وتضامن نظامها الدكتاتوري في المنطقة. وبهذا الهدف تسير بدمار الهجومات على روج افا وباشور كوردستان. بدأت الدولة التركية الأستعمارية مرة أخرى بدمار نضال حرية شعبنا الكوردي في ذكرة مجزرة أرمينيا.أختيارهم في هذا اليوم ليس تصادف. كانت أهداف الدولة التركية تسليم جميع أنجازات الشعب الكوردي في جبال باشور كوردستان. حزب الديمقراطي الكوردستاني وعائلت برزاني في هذا الهجوم فتحت طريق للأستعماريين من أجل مصالحهم الضيقة والشخصيات. أن الدولة التركية بعد ان عرفت انها لا تتمكن من التقدم أرسلت الحزب الديمقراطي الكوردستان البيشمركة إلى ساحات القتال لكي تقاتل أمام مقاتلين حرية كوردستان. تم اعتقال الشخصيات والمندوبين الذين في وجه سياسة التعاون مع الخونة السياسة التي تمشيها الحزب الديمقراطي الكردستاني اليوم تتجاوز خط التعاون وتتحول إلى سياسة عدائية. الحزب الديمقراطي الكوردستاني من الضروري الوقف الفوري لهذه الخطوات العدائية وسحب قواتها من مناطق الكريلا.

أن الاعمال الذي اليوم تفعلها بالتأكيد تساعد العدو. يجب على الشعب الكوردي في كل مكان أن تقوم وتحكم هذه السياسة. هذا اليوم هوا يوم حماية نضال الحرية أمام الخيانة. العدو في شمال وشرق سوريا ، وخاصة في روج افا ، يستخدم أساليب مختلفة لكسر إرادة الثورة. الأولى حصار الثورة وشن حرب عسكرية لإسقاط هذه الثورة من الأسفل إلى الأعلى. حيث لم يمر يوم دون حرب. لكن في الذكرى العاشرة للثورة ،، ان شعوب المنطقة اصبحوا اصحاب التراب والامال وتم اخلاء اهداف العدو. ثورتنا قائمة على إرادة الشعب الكرد والعرب والسريان والأرمن والشباب والعمال والكادحين.إن وجود المرأة وتطورها يحميها من جهة وتطورها هو الحقيقة والأساس للثورة المرأة. وهذا هو السبب في أن العدو يفرض أبشع هجماته وأعماله على النساء والشباب. بالحرب العسكرية من خلال حرب خاصة يريدون تفريغ الثورة من الداخل. المرأة هي اساس المجتمع واساس تدمير الذهنية الذكورية. الشباب أساس الثورة ومستقبلها.



# Jin Bi Berxwedanê Şoreşê Dixemilînin



Îro şoreşa Rojava di sala nehemîn de ye. Şoreşa Jinê ya Rojava, di pêşengbûyîna jinê de, di mijara di nava şer de avakirina azadiya xwe de ji hemû cîhanê re deriyeke nû vekir. Pêvajoya şoreşê, ji hemû jin û giştî mirovahiyê re nişan da ku ji bo azadiya jinê pêdiviya jinan bi hêza parastinê, artêşbûyîna jinê û di jiyanê de meşa ber bi navenda siyasetê ve heye. Heta jin nebe hêzeke profesyonel a gerîla û her wiha bi vê esasê di jiyanê de di her qadê de nebe vîn mirov nikare behsa azadiya jinê û şoreşa jinê bike. Şoreşa Rojava, di destpêkê de bi pratîkên xwe îspat kir ku him di qada civakê de him di eniya şer de şoreşa jinê ye.

Bi hebûna YPJ'a hêza xweparastinê, asayîşa jinê, bi wekhevî tevlêbûna siyasetê, sîstema hevserokatî, kotaya jinê, di milên çand, aborî û civakî de saziyên xweser û bi hevpeymana civakî re maf, tedbir û destkeftinên ku jinan di şoreşê de bidestxistine yên herî despêkê ne. Destkeftiyên ku di asta qanûn û mafan de hatine bidestxistin di heman deme de di jiyanê de di xurtkirina vîna jinan de roleke mezin dilîzin. Jinên ku di dest de çek û şer dikin, jinên di siyasetê de pêş ve derdikevin êdî rûyên şoreşê yên xwezayî ne. Berxwedana jinan a li hemberî DAÎŞ'a ji hêla dewletên paşverû yên herêmê ku dixwestin Şoreşa Rojava ya Jinê ku di nav dilê Rojhilata Navîn de weke berfîneké vekiribû bifetisînin dihat xwedikirin, berxwedana bilehengî ya ku jinan li Efrîn, Serê Kaniyê û Gire Spî li hembêrî dewleta Tirk dan îro hêz dide hemû jinên cihanê.

Di Şoreşa Rojava ya ku di sedsala 21'emin de navê xwe weke Şoreşa Jinê nivîsandiye de tam ji ber vê sedemê berdêla herî giran a van êrîşan jin didin. Jiyana nû ku di pêşengtiya jine de li Rojava tê peşxistin ne tene ji bo hevsengiya cîvaki û siyasî yen di erdnîgariya me de ji bo Rojhilata Navîn û hemû cihanê gefek e. Sedemeke ku dike hêzên herêmê yên paşverû hemû pêşketinên Şoreşa Rojava ji bo xwe wekê gef bibînin jî ev e. Ji ber vê yekê di hevdîtinên ku bi ENKS'ê re tên kirin de ya ku yekemîn tê hedefgirtin destkeftiyên jinan in. Dewleta Tirk a faşîst û metîngêr di herêmên ku dagir dike de di destpêkê de êrîşî jinan dike, hewl dide ku polîtîkayên şerê taybet di ser jinan re bimeşîne. Hişmêndiya DAÎŞ'ê îro jî jinên ku di siyasetê de bûne pêşeng armanc dike. Evana bêguman ne tesaduf in.

Şoreşa Rojava li hember gef û êrîşên dagirkeriya Dewleta Tirk, rêbazên şerê taybet ku bi xeta ENKS'ê tên meşandin, êrîşên dewletên emperyalî yên ji hundir hilweşandina şoreşê li ser lingan e û avakirin û parastina şoreşê didomîne. Jinên ku ji destpêka şoreşê heta anha di her qadê de roleke pêşeng lîstine mîsogeriya şoreşê ne. Dîroka şoreşan jî nişan daye ku tevlêbûneke xurt a jinan çênebe wê dînamîtên bingehîn ên şoreşê baruta xwe winda bikin. Şoreşê nişan da ku azadiya jinê, bi xwebicihkirina hêzeke çalak û pêşeng digihêje rastiyê. Ji ber vê heger ku em li hember êrîşan behsa parastina şoreşan bikin pêwîst e jin di mewziya herî pêş de cih bigirin. Xeta parastin û pêşxistina destkeftiyên şoreşê pewîst e bi hedefa cîhaneke bêçîn, bêsinor û bêzayend bibe yek. Ev jî girîngiya hêza birêxistinî careke din derdixîne holê.

Berxwedanên jinan ên ku mohra xwe li sedsala 21'emîn xistin di xaka Rojhilata Navîn de xwe bi şoreşê tacîdar kir. Jin di xaka Rojhilata Navîn ku zexta li ser jinê herî zede tê jiyankirin de bi avakirina jiyaneke nû riyên nû vedikin. Bêguman qada sereke ku hem taybetmendiya demokratik hem jî taybetmendiya azadîxwaz dide şoreşê xeta azadîxwaziya jinê ye. Jin maf û azadiyên makezagonî yên bingehîn ku ji nîvbûna wan a civakê tên bi dest xistine û saziyên birêxistinbûna jinê xebatên xwe dimeşînin. Li hemberî hişmendiyên paşverû, baviksalar û faşîst sazî, xebat, polîtîka, hêz û artêşên jinan di her qadên jiyanê de li hêviya xwediderketina jinan in.

# المراة بالمقاومة تزين الثورة

يصادف اليوم العام التاسع لثورة روج افا لقد فتحت ثورة المرأة في روج افا، في طليعة النساء ، بابًا جديدًا للعالم كله في مسألة بناء حريته في خضم الحرب. أظهرت عملية الثورة لجميع النساء وللإنسانية بشكل عام أن النساء بحاجة إلى القوة للدفاع عن أنفسهن ، ولأن يصبحن نساء في الجيش ويتجهن نحو مركز السياسة في الحياة. ما لم تكن المرأة قوة حرب عصابات محترفة وبهذا المبدأ في كل مجال من مجالات الحياة ، لا يمكن للناس التحدث عن حرية المرأة وثورة المرأة. أثبتت ثورة روج افا في البداية بممارساتها أنها ثورة نسائية في المجال الاجتماعي وعلى جبهات القتال.

مع وجود قوة الدفاع الذاتي لوحدات حماية المرأة ، أمن المرأة ، بما في ذلك المشاركة السياسية ، والنظام الرئاسي المشترك ، وحصة المرأة ، ومؤسسات الحكم الذاتي في المجالات الثقافية والاقتصادية والاجتماعية ، والحقوق الاجتماعية وحقوق المرأة وتدابيرها وإنجازاتها. في الثورة ليست البداية. تلعب الإنجازات التي تحققت على مستوى القانون والحقوق دورًا رئيسيًا في تعزيز إرادة المرأة في الحياة.

النساء اللواتي يحملن السلاح ويقاتلن ، والنساء اللواتي يتقدمن في السياسة لم يعدن الوجوه الطبيعية للثورة. لقد تكررت مقاومة النساء ضد داعش من قبل الدول المتخلفة في المنطقة التي أرادت قمع ثورة المرأة في روج افا التي انفتحت كالثلج في قلب الشرق الأوسط تمكن جميع النساء اليوم. والمقاومة البطولية للنساء في عفرين وسري كانييه كري سبي وقاموا أمام دولة الأحتلال التركي واليوم هم يعطون القوة لجميع نساء العالم.

إن ثورة روج افا، التي كتبت اسمها في القرن الحادي والعشرين باسم ثورة النساء ، تعيش أثقل تكلفة لهذه الهجمات على وجه التحديد لهذا السبب. الحياة الجديدة التي تروج لها النساء في روج افا ليست فقط تهديدًا للتوازن الاجتماعي والسياسي في جغرافيتنا ولكن أيضًا للشرق الأوسط والعالم بأسره. هذا هو أحد الأسباب التي تجعل القوى الإقليمية المتخلفة ترى كل تطورات ثورة روج افا كتهديد لها. هذا هو السبب في أن الهدف الأول في الاجتماعات مع انكسا هو إنجازات المرأة.

في البداية تهاجم الدولة التركية الفاشية والديكتاتورية النساء في الأراضي المحتلة، في محاولة لفرض سياسات حرب خاصة على النساء. لا يزال فكر داعش يستهدف النساء الذين كانوا قائدات في السياسة. هذه بالتأكيد ليست مصادفات.



# TKŞ'ê bang li gelên cîhanê kir: Bi Şoreşa Rojava re ref bigirin





Komûnîstên Şoreşger 1'ê Gulanê li hemû karker û kedkarên cîhanê pîroz kir û banga berxwedanê kir. TKŞ'ê bal kişand ser gefên li dijî şoreşê û wiha domand: "Banga me li gelên cîhanê ew e ku li hemberî êrîşan û Dewleta Tirk a mêtînger li cem gel, karker, jin û ciwanên Rojava ref bigirin, piştgiriya bi şoreşê re mezin bikin."

Endamên Tevgera Komûnîst a Şoreşger (TKŞ) ji bo 1'ê Gulanê Roja Yekîtî Têkoşîn û Piştgiriya Çîna Karkeran pîroz bikin li Hesekê û Kobanê çalakî pêk anîn.

Komûnîstên Şoreşger li Hesekê ji bo ku 1'ê Gulanê pîroz bikin li Bexçeyê Rêbertiyê daxuyaniya çapemeniyê dan. Di çalakiyê de dirûşmên "Bijî 1'ê Gulanê" û "Bijî Şoreşa Rojava" hatin avêtin.

Endamên Tevgera Komûnîstên Şoreşger (TKŞ) li Kobanê li Qada Jina Azad çalakî li dar xistin. Komûnîstên Şoreşger lafîteya "Bijî ١'ê Gulanê Bijî Sosyalîzm" vekirin û diwîzên "Bijî Berxwedana Gerîla", "Keda Jinê Hêja Ye" hildan.



## TKŞ زارت الاحزاب السياسية

لجنة الحركة الشيوعية الثورية زارت المراكز والأحزاب السياسية في قامشلو والدرباسية.

لجنة الحركة الشيوعية الثورية زارت حزب الأتحاد الديمقراطي والحزب اليساري الكوردي في سوريا. في قامشلو والدرباسية

وفي خلال الزيارات تمت مناقشة الدفاع عن الثورة ضد هجمات المحتلين وهجمات الحرب الخاصة. . في الوقت نفسه ، كان تنظيم الناس حول الثورة ومشاركة الشعب في الثورة على جدول الأعمال ، وأعاد السياسيون التأكيد على أهمية الوحدة والنضال.

بعد الكلمات ، قدم أعضاء الحركة الشيوعية الثورية برامجهم وصحيفتهم إلى الأحزاب وشددوا على ضرورة تعزيز العلاقات بين السياسيين.

# 'Em Soz Didin Em ê Xeyalên Zîlan Pêk Bînin'

Endamên Ciwanên Komûnîst ên Şoreşger (CKŞ), Şehîd Zîlan Destan vegotin. Ciwanan diyar kirin ku wê di riya Zîlan Destan re têkoşîna xwe ya şoreşger bidomînin.

Destan Serhed, "Eşqa rêheval Zîlan a welat û azadiyê roj bi roj mezin dibû. Rêheval Zîlan weke jineke ciwan û komûnîst nedizanîbû biweste, nedizanîbû bê tirs çiye. Me ji rêheval Zîlan wêrekî û vîn girt. Werekiya wê, rûyê wê yê bi ken, rêhevaltiya wê ketiye dile hemû ciwanan. Em soz didin em ê heta dawiyê di riya şehîdên xwe de bin."

Dîren Kobenê jî wiha axivî: "Rêheval Zîlan gelek tişt fêrî me kir. Îro jî dora me ye ku em tiştên rêheval Zîlan fêrî ciwanên din bikin. Em ê ala Zîlan rakin û bibin şopdarê riya wê. Şehîd Zîlan bi rihê ciwntiyê di dile me de ye."

'RÊHEVAL ZÎLAN HER DEM ŞANAZÎ DİDA DER Û DORA XWE'

Lara Yasîn: Her dem armanceke rêheval Zîlan tenê hebû. Li dijî çînên serdest bû. Rêhevaleke bi nirx bû. Çûbaya ku derê bi şêwaz û axaftinên xwe şanazî dida hevalên xwe. Din av ciwanan de karen xweş û delal kir. Ger ku nexweş bibaya jî dîsa ew li ser kare xwe disekinî, tu carî kare xwe berneda."

Îvana Baran got ku: "Em çi qasî li ser rêheval Zîlan biaxivin jî em nikarin wê tam bidin vegotin. Weke rêhevaleke jin vîna wê pir xurt bû. Em ê fikir û ramanên wê belav bikin, em ê riya wê bişopînin. Ew pêşenga jinên ciwan bû. Em bawer dikin û soz didin ku em ê xeyalên rêheval Zîlan pêk bînin."

Gîvara Serhed jî da xuyakirin ku Ciwanên Komûnîst ên Şoreşger wê bibin şopdarê rêheval Zîlan û wiha domand: "Em ê di riya heval Zîlan re bimeşin. Ne tenê Zîlanek bi dehan Zîlan hene di partiya me de. Em fikren rêheval Zîlan dişopînin. Ew ji bo azadiya xwe û welatê xwe têdikoşiya. Em ê jî vê riyê bigihînin dawî."














# Raperîn Dîcle û Zîlan Destan li Qamişlo Hatin Bibîranîn

***QAMIŞLO***

Raperîn Dîcle (Sevda Çagdaş) di 25'ê Puşbera 2016'an de di Pengava Rizgarkirina Minbicê de şehîd ketibû. Di salvegera şehadeta wê de li Pakrewangeha Şehîd Delîl Saruxan a Qamişlo li ser gora wê bîranîn hat lidarxistin. Di bîranînê de di heman demê de Zîlan Destan jî hat bîranîn. Malbata Şehîd Zîlan Destan jî tevlî bîranînê bûn. Endamên Tevgera Komûnîst bi meşekê û bi dirûşman derbasî cihê bîranînê bûn.

Di bîranînê de Mihyedîn Hesen li ser navê Saziya Malbatên Şehîdan axivî û wiha got: "Min şehîd Zîlan baş nas dikir. Zîlan ji bo vî welatî canê xwe da. Ew bû keçika milyonan. Li ser navê TKŞ û CKŞ'ê jî li ser jiyan û têkoşîna şehîd Raperîn û şehîd Zîlan axaftin hatin kirin.

Piştî axaftinan gorên Sevda Çagdaş û Kerem Pehlîvan hatin ziyaret kirin.



# Em ê Pêşenga Şoreşê ya Komûnîst Zîlan Destan Tu Carî Ji Bîr Nekin

**Rêhevala me, pêşenga şoreşê ya komûnîst Zîlan Destan (Elende El Muhamed) li Kobanê hat oxirkirin. Di merasîmê de hat diyarkirin ku Zîlan ji bo şoreşê pêş bixe û li Rojhilata Navîn belav bike heta kêliya dawî têkoşîn kir. Di merasîmê de hat gotin ku “Heta çar perçeyên Kurdistanê bên azadkirin em ê riya te bişopînin”.**

***KOBANÊ***

Pêşenga şoreşê ya komûnîst Zîlan Destan di 16’ê Pûşberê deli Pakrewangeha Şehîd Dîcle bi dirûşman hat oxirkirin. Ji bo rêhevala me Zîlan Destan û ji bo şehîdên HPG’ê ku li Metîna, Zap û Avaşîn şehîd ketine merasîmeke hevbeş hat lidarxistin.

Cenazeyê Şehîd Zîlan sibeha16’ê Pûşberê bi merasîmekê ji Qamişlo hat oxirkirin. TKŞ, JKŞ, CKŞ, Saziya Malbatên Şehîdan û QSD’ê tevlî merasîmê bûn. Dayikên şehîdan cenazeyê Şehîd Zîlan bi dirûşmên “Şehîd Namirin” siwarî ambûlansê kirin. Cenaze ji Qamişlo bi karwanekî ber bi kobanê de bi rê ket. Li Kobanê jî gelên Kobanê û endamên Tevgera Komûnîst bi karwanekî girseyî cenaze pêşwazî kirin û birin Nexweşxaneya Şehîd Sarya.



17’ê Pûşberê berêvarî girse li ber Mişfeya Şehîd Sarya kom bûn. Girse bi dirûşmên “Zîlan Destan Nemir e” û “Şehîd Namirin” cenaze rakirin û bi karwanekî girseyî derbasî Pakrewangeha Şehîd Dîcle bûn. Endamên Tevgera Komûnîst di merasîmê de lafîteya “Pêşenga Ciwan a Komûnîst Zîlan Destan Nemir e” rakirin.Cenaze berî bigihêje Pakrewangehê gelên Kobanê cenaze ji ambûlansê girtin û hildan ser milan.

Arîf Balî li vir li ser navê Malbatên Şehîdan axivî diyar kir ku kesên di têkoşîna azadiyê de şehîd ketine wê neyên ji bîr kirin.

‘EM Ê ALA ŞEHÎDAN HER DEM HİLDİN JOR’

Wezîrê Parastinê yê Herêma Firatê Şêx Îsmet Hesen di axaftina xwe de bal kişand ser bibîranîna şehîdan. Îsmet Hesen wiha axafina xwe domand, “Ew kesên ku ji bo gelê Kurd û doza azadiya Kurdistanê dayik, bav û zarokên xwe hiştine xwediyên esasî yên Kurdistanê ne. Ew kesên ku bi şev û roj di destên xwe de çek û bi dijmin re rû bir û dimînin ew xwediyên Kurdistanê ne.”

“KDP’ê bi Dewleta Tirk re hevakriyê dike. Kesên ku bi dijmin re hevkar in, ji dijmin re li çepkan dixin şerm û fediya herî mezin dikin. Pêwîst e her kes rastiyan bibine, riya heqîqetê nas bike. Ên ku didin pêşiya dijmin û wan dibin ser hevalên me xayin in. Ew kesên ku bi Dewleta Tirk re hevkar in dijminê gelê Kurd in.”

Hesen di dawiya axaftna xwe de diyar kir ku ji bo ala şehîdan nekeve erde wê têkoşîna xwe mezintir bikin.

‘XWE Jİ BO ŞOREŞÊ FEDA KİR’

Berîtan Asya li ser navê TKŞ’ê axivî û bal kişand ku li pakrewangeha Kobanê gorên bi hezaran şehîdan hene. Berîtan Asya wiha berdewam kir, “ Şehîdan xaka me rûmeta me parastin. Di her çar perçeyên Kurdistanê de gelê Kurd ji bo rûmet û azadiyê têkoşîn dike. Rêheval Zîlan jî di riya şehîdan re meşiya û rûmeta me parast. Jineke ciwan bû û ji Kobanê bû. Zaroka vî welatî bû. Di şerê Efrînê de, di şerê Serê Kaniyê de ji bo vê şoreşê çi pêwîst be ked da wê. Rojekê di destên wê de çek hebû şervan bû, rojeke din di destên wê de pênûs hebû û mamoseya şoreşê bû.”

“Zîlan Destan pir baş dizanîbû ku wê rojekê şehîd bikeve û vegere Kobanêya kul ê çêbûye û mezin bûye. Her dem bi baweriyeke mezin digot ‘ez ê rojekê vegerim pakrewangeha Kobanê’. Tu bi xêr hatiye heval Zîlan. Rêhevalên te wê ala sor ku ji te teslîm girtine hîn bêhtir bilind bikin, mîna ku te ala Şehîdên Pirsusê rakiriye. Te çawa navê şehîd Destan Temûz rakir, rêhevalên te jî wê te bişopînin.”

‘EM SOZ DİDİN EM Ê Dİ RİYA ZÎLAN RE BİMEŞİN’

Berîtan Asya da xuyakirin ku em ê bibin şopdarê Zîlan Destan û wiha domand, “Te dixwest ku rojekê were şehîdlika Kobanê. Binere îro bi hezaran kes li ber te amade ne. Çawa te soz da şehîd Baran û şehîd Destan em jî îro soz didin te. Heta ku çar perçeyên Kurdistanê bên azadkirin em ê riya e bişopînin.”

Berîtan Asya êrîşên Dewleta Tirk û çeteyên wê bi bîr anî û diyar kir ku Rêheval Zîlan demeke dirêj di wan çiyayan de têkoşîn kiribû. Asya di dawiya axaftina xwe de soza xwedîderketina li mîrateya rêheval Zîlan da.

‘ARMANCA WÊ Lİ ROJHİLATA NAVÎN BELAVKİRİNA ŞOREŞÊ

Erdal Cebo jî li ser navê Ciwanên Komûnîst ên Şoreşger axivî û wiha got, “Bi şehadeta rêhevl Zîlan em serbilind in. Her maleke Kobanê xwedî şehîd e, serê wan bilind e. Rêheval Zîlan weke jineke ciwan û komûnîst ji bo şoreşê bigihîne sosyalîzmê xebitî. Armanca wê ew bû ku şoreşê li çar perçe Kurdistanê belav bike.”

“Zîlan Destan rêbereke biryadar a ciwanan bû. Li hemû herêmên Rojava ji bo ku ciwanan tevlî şoreşê bike ked da û xebat meşand. Li herêma Cizîrê mal bi mal gund bi gund geriya. Perwerde da, civîn li dar xist, xebat meşand.”

Erdal Cebo da xuyakirin ku Zîlan Destan di jiyana xwe de her dem şehîd wek nirxeke pir grîng parast û wiha got, “Şehîd Destan Temuz ji bo heval Zîlan riyeke nû vekir. Zîlan bi şehîdên Pirsusê vîna xwe xurtir dikir. Şehadeta Fermandarê me Baran Serhed rêheval Zîlan pir bi bandor kir û gavekê pêş ve derket. Em jî li ber hemû şehîdan soz didin wê dile me û fikra me her dem bi we re be. Em ê şoreşê bigihînin serkeftinê û sosyalîzmê ava bikin.”

Di merasîmê de li ser navê malbatên şehîdan û Kongra Star jî axaftin hatin kirin.

Piştî axaftinan cenazeya Zîlan Destan hate hildan û bi dirûşman hat oxirkirin. Şehîd Zîlan dema dihat spartin xaka xwe sirûdên şoreşger hatin gotin û dirûşmên “Şehîd Namirin”, “Zîlan Destan Namire”, “Dîsa Dîsa Serhildan MLKP Kurdistan” hatin avêtin.

Piştî merasîmê konê azayê ku li ber deriye malbata şehîd Zîlan Destan hatibûdayin hat ziyaretkirin.








# Pêşengtî Ciwan e



**ROZA TEMÛZ /** Şoreş nûbûyin e, serûbinbûyin e. Ciwan dinamik in, zû tevdigerin, wêrek û militan in. Di şoreşan de ciwan bi van taybetmendiyên xwe pêş ve derdikevin û dibin hêza pêşeng û kêşker a şoreşê. Di şoreşa Rojava de jî ciwan di eniyên parastinê de cihê xwe girtin û bi hezaran şehîdan şoreşa xwe ava kirin û parastin. Jinên ciwan bi tevlêbûna xwe ya şer û erken parastinê şoreş weke Şoreşa Jinê xemilandin û bidest xistin.

Ciwanên çar perçeyên Kurdistanê û Tirkiyê di şoreşa Rojava de erkên xwe yên herî grîng di eniyên parastinê de bi cih anîn. Çeteyên DAÎŞ'ê bi mildayina Dewleta Tirk ji bo fetisandina şoreşê êrişeke mezin anîn ser Kobanê. Ciwanan li hember van êrişan cepheyeke berxwedanê ava kirin. Bi sedan ciwanên keç û xort ên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê ji bo parastina Kobanê seferber bûn. Bi koman sînor derbas kirin û di berxwedana rûmet û azadiyê de cihê xwe girtin. Li hemberî DAÎŞ'ê laşên xwe kirin mertal û bi rihekî pakrewan şer kirin. Ciwanên Bakurê Kurdistanê, Tirkiyê û Rojava bi hev re bûn sazkarên serkeftina berxwedana Kobanê.

Piştî azadiya Kobanê û serkeftina şoreşê li pêşiya ciwanên me erkên avakirina şoreşê hebûn. Ciwanên komûnîst ên Bakurê Kurdistanê û Tirkiyê xwestin ku li xaka bi xwîna şehîdên ciwan hatiye avdan di erken avakirina şoreşê de jî cih bigirin. Bi vê armancê ciwanên komeleya SGDF'ê bi dirûşma "Me bi hev re parast em ê bi hev re ava bikin" rêzexebatek dan destpêkirin. Bi sedan ciwan dema ku di 20'ê Tirmeha 2015'an de li Pirsusê kom bibûn û amadekariya derbasbûyina Kobanê dikirin çeteyekî DAÎŞ'ê êrîşeke xwekujî ku bi deste polîsên AKP'ê û Dewleta Tirk hatibû birêxistinkirin pêk anî. Di vê êrîşê de 33 komûnîstên ciwan bûn pakrewan û tevlî nava refên nemiran bûn.

Şoreşa Rojava di sedsala 21'emîn de ji bo hemû mirovahiyê bû pêteke pêşeng. Her çi qasî weke têkoşîna azadiya gelê Kurd dest pê kiribe jî ji ber taybetmendiya xwe ya demokratîk bi lez veguherî şoreşa azadiya gelên herêmê. Di erdnîgariya me de her çi qasî gelan serî hildabe jî nebûye ku pergaleke weke ya şoreşa Rojava demokratik û azadîxwaz ava bikin. Şoreşa Rojava di heman demê de berhema têkoşînên azadiya jinan e. Ev şoreşa ku bi taybetmendiyên xwe wiha grîng e berhema keda ciwanan e. Îro pêwîst e şoreşa Rojava û hemû pêkhateyên wê yên şoreşger li van dîrokên bi nirx xwedî derkevin û li her dere wan ciwanan bibîr bînin.

Pêşenga Komûnîst Şehîd Zîlan di xwedîderketina şehîdan de asteke nû ji ciwanan re hişt. Şehîd Zîlan nîşan da ku xwedîderketina li şehîdan bi ked û fedaîbûyinê dibe. Wê bi tevlêbûn, xebat û şehadeta xwe bersiva herî zelal û delal da Şehîdên Pirsusê.

Ciwanên Komûnîst ên Şoreşger (CKŞ) ji bo xwedîderketina li Şehîd Zîlan û 33 ciwanên komûnîst vê mehê dest bi rêzexebatên xwe dikin. Ciwanên CKŞ'ê dê kolan bi kolan û mal bi mal bigerin, şehîdên şoreşê bidin naskirin. Di heman deme de cîwan ji bo bîranîna şehîdan û xurtkirina bîrdariya ciwanên şoreşê dest bi avakirina pirtukxaneyeke mezin dikin. Pêwîst e hemû kesayet û pêkhateyên şoreşger di vê rêzexebata pîroz ku wê şoreş û şehîdên wê bên danasîn de cih bigirin û bi keda xwe û diyariyên xwe vê mîrateyê mezin bikin. Şoreş berhema şehîdan e û encax di riya şehîdan re dikare bê parastin.

## CKŞ'ê Destan Temûz li ser gora wê bi bîr anî

Ciwanên Komûnîst ên Şoreşger (CKŞ) şervana MLKP'ê Destan Temûz li ser gora wê ya li Kobanê bi bîr anîn.

Li ser navê CKŞ'ê di axaftinê de wiha hat gotin: "Her kesî ew di berxwedana Geziyê de bi çalakiya wê ya pêşeng nas kir." Di axaftinê de hat bîrxistin ku di serhildana Geziyê de Rêheval Destan jî çar mehan di hepsa Tirkan de ma. Piştî demekê ji bo Şoreşa Rojava biparêze û mezin bike, ji bo ku li hemberî DAÎŞ'a dijminê jinan e şer bike derbasî Rojava bû û di Pengava Rizgarkirina Reqayê de şehîd ket.

Nûnera CKŞ'ê diyar kir ku Destan Temûz din av nifşa ciwan de nûnera şoreşgeriya fîdayî ye û wiha pê de çû: "Em ê di riya wê hemû şehîdên xwe re ala şoreşê heta serkeftinê hilbigirin. Em careke din soz didin hemû şehîdan."




# طليعة الشبيبة

الثورة انها تجديد الشبيبة ديناميكيا وسريع المفعول وشجاع ومناضل. في الثورة ، يطور الشبيبة هذه الصفات ويصبحون القوة الدافعة والقائدة للثورة. في ثورة روج آفا أخذ الشباب مكانهم في الجبهات الدفاعية وضحوا بآلاف الشهداء ودافعوا عن ثورتهم. قامت الشابات بتزيين وحققت الثورة كثورة نسائية من خلال مشاركتهن في مهمات الحرب والدفاع.

اقاموا شباب الأجزاء الأربعة من كردستان وتركيا بأهم واجباتهم في الجبهات الدفاعية خلال ثورة روج آفا. شنت عصابات داعش هجوما كبيرا على كوباني بمساعدة الدولة التركية لقمع الثورة. شكلوا الشباب جبهة مقاومة ضد هذه الاعتداءات. حشد المئات من الشابات والشباب من شمال كردستان وتركيا للدفاع عن كوباني. عبرت الحدود مع مجموعات وأخذوا مكانها في النضال من أجل الكرامة والحرية. لقد حموا أجسادهم من داعش وقاتلوا بروح دعاة السلام. أصبح شباب باكور كوردستان وتركيا وروج آفا معًا مؤسسي نجاح مقاومة كوباني.

بعد تحرير كوباني وانتصار الثورة ، كان على شبابنا مهمة بناء الثورة. أراد الشباب الشيوعيين في باكور كردستان وتركيا المشاركة في مهمة بناء الثورة في الأرض المروية بدماء الشهداء الشباب. ولهذه الغاية ، بدأ الشباب بتجميع سلسلة من الأنشطة تحت شعار "دافعنا معًا ، سنبني معًا". تجمع مئات الشباب في بيرسوس في ٢٠ تموز / يوليو ٢٠١٥ ، استعدادًا للعبور إلى كوباني ، حيث نفذت عصابة من تنظيم الدولة الإسلامية عملية انتحارية نظمها حزب العدالة والتنمية وشرطة الدولة التركية. في هذا الهجوم ، أصبح ٣٣ شابًا شيوعيًا مسالمين وانضموا إلى صفوف الخالدين.

كانت ثورة روج افا في القرن الحادي والعشرين خطوة رائدة للبشرية جمعاء. على الرغم من أنها بدأت كنضال من أجل حرية الشعب الكردي ، بسبب طبيعتها الديمقراطية ، إلا أنها سرعان ما تحولت إلى ثورة من أجل حرية شعوب المنطقة. في جغرافيتنا ، بغض النظر عن مدى تمرد الناس ، لم يكن من الممكن إنشاء نظام مشابه لنظام الثورة الديمقراطية والليبرالية في روج افا. ثورة روج افا هي أيضا انتاج نضالات تحررية نسائية. هذه الثورة ، التي تعتبر مهمة في حد ذاتها ، هي انتاج عمل الشباب. اليوم من الضروري للثورة في روج افا وكل مكوناتها الثورية أن يكون لها مكانة قيّمة في هذه التواريخ وأن تتذكر هؤلاء الشباب في كل مكان.

القائدة الشيوعية شهيدة زيلان بصحبة الشهداء تركت مرحلة جديدة للشبيبة,الشهيدة زيلان اوضحت ان تكون قد ثأر الشهداء تريد النضال والتضحية,وهيا ايضأ بأنضمامها وعملها وشهادتها جاوبت بجواب صافي وجميل على شهداء برسوس.

تطلق الشبيبة الشيوعية الثورية حملتها هذا الشهر لتولي عمل ٣٣ شابًا شيوعيًا. سوف تسير الشبيبة الشيوعية الثورية في الشوارع ومن منزل إلى منزل ، تقديرًا لشهداء الثورة. في الوقت نفسه ، بدأ الشباب ببناء مكتبة كبيرة لإحياء ذكرى الشهداء وتقوية ذاكرة شباب الثورة. من الضروري أن تشارك جميع الشخصيات والمكونات الثورية في هذه العملية المقدسة التي يتم فيها الاعتراف بالثورة وشهدائها وتعزيز هذا الإرث بعملهم الجاد ومواهبهم. الثورة انتاج الشهداء ولا يمكن الدفاع عنها الا بالشهداء.

# Şoreş

Şoreş bi wateya peyvê hilweşandina tiştên kevin û li dewsa wê avakirina tiştên nû ye. Bi awayekî radîqal guhertina hemû tiştên eydî kevnariyê û li dewsa wê avakirina yên nû ye. şoreş bi awayekî kokdar guherîn e. Di carekê de û bikotekî pêk tê. Şoreşa siyasî rasterast iqtidarê hedef digire, pergala heyî bikotekî hildiweşîne û pergaleke nû ya siyasî ava dike. Şoreşa civakî pergala civakî ya damezrandî diguherîne, li dewsa wê pergaleke civakî ya cûda ava dike.

Ger em ji Rojava mînak bidin: Şoreşa Rojava bi rêya têkoşîna çekdarî ya gel dawî anîna desthiladariya BAAS a mêtînger û li dewsa wê avakirina iqdidara şoreşger ya gel e. Ji bo avakirina tiştekî nû pêwîst e yê kevin bê hilweşandin. Ji bo azadiya netewî pêwîst e dewleta mêtînger bê hilweşandin. Ji bo demokratîkbûn û azadiya polîtîk pêwîst e dewletên paşverû û faşîst bikotekî ji holê bê rakirin.

Marx dema şoreş şirove dikir wek “şertên heyî yan jî statû, ango ji guhertina civak an jî dewletê pêkhatî ye, lewre şoreş çalakiya polîtîk an jî civakî ye” nîşan dabû.

Lênîn şoreşa siyasî wek “ji bo guherîna wesfa dewletê ya siyasî destdanîna ser dewletê” şirove dike.




Şoreş pêşketina bi qewastin e. Peresan guherînên ku hêdî hêdî pêk tên e. Şoreş guherînên ku di bingeha hilweşîna tiştên kevin bi awayekî zû çêdibe ye. Şoreş di carekê de dibe û pêvajoyeke êşa xwe kêm e. Peresan jî pêvajoyeke ku belavî salan dibe ye û êşa xwe hîna zêdetir e.

Şoreş yekser bi çalakiyekê, bi tevgerekê, ji ber xwe ve pêk nayê. Bi têkoşîna rêxistinkirî ya bindestan ve tê amadekirin, bi liberçavgirtina şertên heyî û bi nirxandina awaêî herî baş pêk tê.

Guherînên siyasî yên mezin tenê bi riya şoreşê tên pêkanîn. Mîtora dîrokê şoreş in. Dema Çînên serdest li ber pêşveçûyîn û pêşketina civakan dibin asteng, ji bo rê li ber vekirina pêşketinê pêwîst e ev çînên paşverû ji iqtidarê dûr bên xistin. Ger ku ev nebe civak êşên mezin dikişîne, bi rizîn û dejenerebûnê mecbûr dimînin ku di bin her cûre sîstemên mêtînger û zordarî de jiyan bikin.

Di roja me de ji bo ku karker û kedkaran ji jiyana xizanî, bêkarî û şertên xizaniyê rizgar bibin pêwîst e pergala mêtînger a kapîtalîst û dewleta ku zêrevaniya wan dike, bi serhildana gel a çekdarî were hilweşandin. Şoreş ne hilbijartineke, pêwîstiyeke dîrokî ye.

Şoreşa Rojava wek şoreşa gelê me yê Kurd a dijî mêtîngeriyê û demokratîk destpê kir di serî de dawî li hebûna polîtîk a mêtîngeriya BAAS anî. Bi vê şoreşê gelê me azadiya xwe ya netewî bi dest xist. Piştre ji bo şoreşa yekbûyî bi gelê me yê Ereb ve itifaq damezrand. Gelê Kurd û Ereb hem bi şerê li dijî rejîma BAAS, hem jî li dijî paşverûtiya DAÎŞ’ê azadiya xwe ya polîtîk bi dest xistin. Şoreşa Rojava şêweya şoreşa gel a demokratîk a Bakur û Rojhilatê Sûrî girt.

Şoreşa me ya gel a demokratîk û dij mêtîngêriyê hîna temam nebûye. Li du parçeyê Kurdistanê yên din pergala mêtîngêriyê berdewam dike. Lewma li dijî mêtîngêriyê erka me ya têkoşîna şoreşê li pêş me disekine. Dîsa pirsgirêka azadiya polîtîk û demokratîkbûna Sûrî li benda çaresariyê ye. Lewma bi hilweşîna desthiladariya Esad û bi şoreşeke ku seranserî Sûrî wergire nav xwe wê gava duyemîn temam bibe.

Gava duyemîn şoreşa sosyalîst e. Gelên Bakurê Sûrî û Rojava ku şoreşa siyasî azadiya xwe ya polîtîk bi dest xistin, wê bi pêkanîna şoreşa civakî hemû bermayiyên kapîtalîzmê ji holê rakin û bi avakirina meclîsên karker û kedkaran wê dest bi avakirina sosyalîzmê bikin. Di heman demê de gavên yekem û yên duyemîn ên şoreşê divê bi şoreşa jinê re bên yekirin. Ji bo rizgariya jinên ku nêviyê civakê pêk tînin şoreşa jinê mecbûriyeteke. Li dewsa pergalên paşverû yên baviksalarî bi pergala wekheviya zayendî rizgariya jinan tê misogerkirin. Li dijî bermayiyên pergala zilamperest û civaka biçîn a ku hilweşiyaye lê hîna tune nebûye rêya herî ewledar a misogerkirina şoreşa me ev e.

Hedefa şoreşa sosyalîst rakirina ji holê ya milkê taybet e ku jêderka hemû çînên mêtînger e û vegerandina milkiyeta civakî ye.

Şoreş berhema girseyan e. Wek berhema şerê çînî ku di navbera çînên dijminê hev in derdikeve dika dîrokê. Karker û kedkar ji bo xwestekên xwe yên pêşveçûna civakê baskên şoreşger ên şerê çînî pêk tînin. Çînên serdest, burjuvaziyên kedxwar ji bo xwestêkên xwe yên berdewamkirina pergala xwe ya kevin temsîla baskê dijî şoreşgeriyê dikin. Şoreş di encama têkoşîna navbera van du baskan de derdikeve holê. Taybetmendiya herî girîng a ku şoreşan ji derbeyên leşgerî yan jî siyasî cûda dike tevlîbûna gel a girseyî ye.

Karker û kedkar, gelên me yên bindest di bin rêbertiya partiyên xwe de tevlî şoreşê dibin. Ango şoreş di heman demê de berhema girseyên birêxistinkirî ye. Tevgera Komûnîst a Şoreşger xwedîderketina karker û kedkaran û xwedîderketina gelên Kurd û Ereb li iqtidara yekbûyî ya gel dike armanc û di bernameya xwe de derpêş dike ku gel bi şerê gelê şoreşger parastina xwe bike.  TKŞ’ê, pêşengtiya erka temamkirina şoreşa demokratîk û gelperêz û bi şoreşa sosyalîst ve yekirinê û pêşengtiya çalakiya avakirina civaka nû dike.

# الثورة

الثورة تعني تدمير الأشياء القديمة وبناء أشياء جديدة بدلاً منها، إنه يغير جذرياً كل الأشياء القديمة ويستبدلها بأخرى جديدة. الثورة تتغير بشكل جذري، يحدث في وقت واحد وقليلا، تستهدف الثورة السياسية السلطة مباشرة وتدمر النظام الحالي وتخلق نظاماً سياسياً جديداً، تحول الثورة الاجتماعية النظام الاجتماعي القائم، بدلاً من ذلك يخلق نظاماً اجتماعياً مختلفاً.

إذا أخذنا مثال روج آفا: ثورة روج آفا من خلال النضال المسلح للشعب هي نهاية الحكم الاستبدادي لـ النظام البعثي وإقامة السلطة الشعبية الثورية بدلاً من ذلك. لبناء شيء جديد من الضروري هدم القديم. يتطلب التحرر الوطني الإطاحة بالدولة القمعية من أجل الديمقراطية والحرية السياسية، يجب القضاء على الدول المتخلفة والفاشية.

عندما وصف الثورة، وصفها ماركس بأنها "ظروف أو أوضاع قائمة أو تغيير في المجتمع أو مكونات المجتمع لأن الثورة هي عمل سياسي أو اجتماعي".

يصف لينين الثورة السياسية بأنها ."محاولة لتغيير شخصية الدولة""

الثورة التقدمية، هي التغييرات التي تحدث ببطء. الثورة هي تغيير يقوم على التدمير السريع للأشياء القديمة، الثورة التي تحدث في وقت واحد وعملية الألم نفسها تكون قليلة، العبادة هو أيضاً عملية تنتشر على مر السنين ويكون الألم كبيراً.

إن الثورة لا تحدث على الفور بالعمل أو الحركة بنفسها حيث يتم إعداده من خلال النضال المنظم للمضطهدين ومن خلال مراقبة الظروف القائمة وتقييم أفضل السبل.٠

لا يمكن تحقيق تغييرات سياسية كبيرة إلا من خلال الثورة.

إن أساطير التاريخ ثورية، في حين أن الطبقات السائدة تعيق تقدم المجتمعات وتطورها فمن الضروري إزالة هذه الطبقات المتخلفة عن السلطة لتمهيد الطريق لفتح التقدم. يعاني محور هذا المجتمع إلى حد كبير، حيث أجبرت المرونة والانحلال .على العيش في ظل جميع أنواع الأنظمة القمعية والقمعية

في عصرنا هذا من أجل إنقاذ العمال والكادحين من حياة الفقر والبطالة وظروف الفقر يجب إسقاط النظام القمعي الرأسمالي والدولة التي تحميهم من قبل انتفاضة شعبية مسلحة. الثورة ليست خيا إنها ضرورة تاريخية.

بدأت ثورة روج آفا كثورة لشعبنا الكردي ضد القمع والديمقراطية وانهت الوجود السياسي لـ الحزب البعثي، مع هذه الثورة حصل شعبنا على حريتهم الوطنية. ثم شكلت تحالفاً مع شعبنا العربي من أجل ثورة موحدة. اكتسب الشعبان الكردي والعرب حريتهم السياسية من خلال الحرب ضد نظام البعث وضد تخلف داعش. أخذت ثورة روج آفا شكل ثورة شعب ديمقراطي في شمال وشرق سوريا.

ثورة شعبنا الديمقراطية والمعادية للاستعمار لم تكتمل بعد، يستمر نظام المراقبة في الجزئين الآخرين من كردستان. هذا هو السبب في أن واجبنا لمحاربة الثورة يقف أمامنا، لا تزال قضية الحرية السياسية والديمقراطية في سوريا معلقة وهذا هو السبب في أن المرحلة الثانية ستنتهي باسقاط نظام الأسد وثورة ستنتشر في جميع أنحاء سوريا.

المرحلة الثانية هي الثورة الاشتراكية.٠

إن شعب شمال سوريا و روج آفا الذي فازت ثورته السياسية بحريته السياسية سيقضي على جميع بقايا الرأسمالية من خلال تنفيذ الثورة الاجتماعية وسيبدأ في بناء الاشتراكية من خلال بناء التجمعات العمالية والكادحين. في الوقت نفسه يجب مساواة الخطوتين الأولى والثانية للثورة مع ثورة المرأة. إن ثورة المرأة أمر لا بد منه لخلاص النساء اللاتي يشكلن جزءاً من المجتمع، فبدلاً من الأنظمة المتخلفة الأبوية يتم ضمان المساواة بين الجنسين لإنقاذ المرأة، وهذه هي الطريقة الأكثر أماناً لضمان ثورتنا ضد بقايا النظام الذي يسيطر عليه الذكور والمجتمع الذي انهار ولكنه موجود بعد.

إن الهدف من الثورة الاشتراكية هو إلغاء الملكية الخاصة .التي هي مصدر كل الطبقات القمعية وعودة الملكية الاجتماعية

الثورة هي نتائج الجماهير، نتيجة للحرب الطبقية بين طبقات العدوة يخرج في التاريخ. يشكل العمال والكادحين الأجنحة الثورية للحرب الطبقية من أجل تطلعاتهم في التنمية الاجتماعية. تمثل البرجوازية الحاكمة للطبقة العاملة المعقل المناهض للثورة لمطالبهم بمواصلة نظامهم القديم. الثورة هي نتيجة صراع بين الفرعين،أهم ميزة تميز الثورات عن الانقلابات العسكرية أو السياسية هي المشاركة الجماهيرية للشعب.

العمال والكادحين وشعوبنا المضطهدة ينضمون إلى الثورة تحت قيادة أحزابهم، أي أن الثورات هي نتاج الجماهير المنظمة. تهدف الحركة الشيوعية الثورية إلى توظيف العمال والكادحين وحماية الشعوب الكردية والعربية في السلطة الموحدة للشعب وتقديم برنامجها لحماية الشعب من خلال حرب الشعب الثوري. كما أنها لا تأخذ زمام المبادرة في استكمال الثورة الديمقراطية والشعبية بالثورة الاشتراكية وقيادة العمل لبناء مجتمع جديد.

TKŞ

Ciwanên Komûnîst ên Şoreşger
الشبيبة الشيوعية الثورية
CKŞ

Jinên Komûnîst ên Şoreşger
المرأة الشيوعية الثورية
JKŞ



# Elende El Muhammed

**Pêşenga Ciwan a Komûnîst Zîlan Destan Nemir e**

**قائدة الشبيبة الشيوعية زيلان دستان خالدة**